

## ROJAN HAZIM

### Axivtina li Konferansa Zanistî ya Zimanê Kurdî li Hewlêrê

19 – 20 – 21 – 22 Îlon 2011, Hewlêr



#### **Bisporên zimanî, mamosta û beşdarên hêja yên Konferansa Zanistî ya Zimanê Kurdî li Hewlêrê,**

Di destpêkê da em spasî Wezaretê Kulturê û Lawan û wezîrê hêja birêz Dr. Kawa Mehmûd dikin ku em vexwandine konferansê. Herwisa em Serokatîya Herêma Kurdistanê û Hukûmeta Herêma Kurdistanê jî pîroz dikin ku imkan dayîne vê konferansê. Li Hewlêrê konferanseke li ser zimanê Kurdî çêkirin bi serê xwe gaveke giring û bi mana ye. Dagîrîya li ser sê parçeyên Kurdistanê didome, lê li beşê başûr di rêya

rizgarîya Kurdistanê da gaveke gelek mezin pêkhatîye û di nav Iraqa Federal da Kurdistan azad bûye û îdareyeke xweser pêkhatîye. Hewlêr paytextê Kurdistana Federal e. Zimanê Kurdî bi vê hebûnê ve fermîyet wergirtîye û îro li Kurdistana Federal jîyan pêkve Kurdî ye û eve herwisa serkevîna zimanê Kurdî ye jî. Ev serkevîna ne tinê ji alîyê polîtîk ve giring e, herweha ji alîyê kulturî, sosyal, ekonomîk, edebî û hunerî ve jî giring e. Zimanê Kurdî li vî beşî gihiştîye statuya xwe ya xwezayî. Zimanê Kurdî di vî beşê Kurdistanê da zimanê dewletê ye û bi vê yêkê paşeroja neteweyê Kurd ronahî û garantî kirîye. Eve tesbîteke hevpar ya hemû Kurdan e.

Lê belê, ev rastîye nayê wê manayê ku zimanê Kurdî ji pirs û pirsgerêkên zimanî xilas bûye. Ziman wekî organekî jînde dînamîk e, ne statîk e. Bi jîyanê ve jîyanê werdigire û dijî û dide jîyandin. Lewma li goreyî herikîna jîyanê herdaîm divêt nûve bibe. Pêşvebirin û xurtkirina zimanî bi rê û metodên zanistî mumkun e. Eve jî karê bisporên zimanî ye. Kombûn û konferansên zanistî yên li ser zimanî lewma gelek giring in û divêt bi van rêyan prosesa pêşveçûna zimanî bête xurt û saxlem kirin. Em hêvî dikin ev konferanse jî bibe platformeke bi vî rengî û bi metodên zanistî hewcehîyên zimanê Kurdî bêne tesbît kirin û ziman bête xurt kirin û kalîteya zanistî ya zimanî bête bilind kirin.

#### **Beşdarên hêja,**

Pirsa zimanê Kurdî gelek giring e. Bi giştî kesên bi karê zanistî mijûl dibin û helbet zana û bisporên zimanî jî divêt bi cesareta zanistî resmê zimanî bi hemû detayan ve bikêşin. Lê mixabin îro bi giştî Kurd û bi taybetî jî bispor û zanayên zimanê Kurdî hêj jî li ser rewş û pirs û pirsgerêkên zimanî bi giringî serwest nebûne. Pirsasîmîlasyonê û hetta otoasîmîlasyonê danin alîyekê. Esas pirs di hev negihîştina zimanî ye. Di vê çarçoveyê da xala esasî alfabeya Kurdî ye. Iro Kurdî bi giranî bi du alfabeyan tete nivîsîn: Alfabeya bi tîpên Latînî û alfabeya bi tîpên Aramî-Erebî. Di demê Sovyetan da Kurdên Ermenistanê û yên li cografyaya Sovyeta alfabeya bi tîpên Kîrîlî bi kar tînan. Lê piştî hilweşîna Sovyetan îro êdî hukmê alfabeya Kîrîlî nemaye. Zaravayên Soranî û Hewramî bi alfabeya bi tîpên Aramî-Erebî, zaravayên Kurmancî û Zazakî jî bi alfabeya tîpên Latînî tene nivîsîn. Di vê ekuasyonê da pirsasî sereke di hev negihîştine. Kurd di warê zanistî, nivîskarî û edebîyat û hunera nivîskî da di hev nagihin. Cudatîya alfabeya bi sembolên cuda, anku alfabeya bi sembolên Latînî û Aramî-erebî,

zaravayan ji hev dûr dike û di hev gihîştinê asteng dike. Eve digel xwe bivê nevé dûrketina bîr û hizirê jî tîne. Di platformên zanistî da divêt barîyer û hisab û kitabên polîtîk rol neliyizin, pirs çî be divêt bête gotin, bi gotineke dî nisaxî çî be divêt bête bi nav kirin ku derman peyda bibe. Heta ku Kurd bi du alfabeyên cuda binivîsin, anku bi du alfabeyên ku sembolên wan ji hev cuda binivîsin, ne dikarin di prosesa yêkitîya zimanî da zaravayan nêzîkî hev bikin, ne jî rê li ber hevdu gihîştinê dikarin vekin. Du alfabetî, anku du alfabetîya bi sembolên cuda, dê ferqîyetên zimanî kûrtir bike û eve dê tesîrê li ser tercîhên polîtîk jî bike û Kurd dê ber bi dualîtîya neteweyî û du zimanîtîyê ve biçin. Rê û rêbaza yêkitîya alfabeyê helbet dê dem bigire, proseseke dirêj e, lê divêt bi biryardarî gav bête avêtin. Heta ku sembolên alfabeyê di pratîkê da dibin yêk, mumkun e ku heta demekî vebirî herdu alfabe di nav sîstemê perwerdeyê da paralel bêne bi kar înan. Ji bo tertûbkirina vê prosesê dibe ku komisyoneke zanistî bête ava kirin û ev komisyone nexşeyê rêya yêkkirina alfabeyê, anjî yêkkirina sembolên alfabeyê plan bike û metodekî zanistî tesbît bike û li goreyî vî metodê zanistî prosesê organîze bike û îdare bike.

Heke planê yêkkirina alfabeyê, anjî yêkkirina sembolên alfabeyê bi rêkûpêkî hate tenzîm kirin hingê pirsgirêkên dî yên zimanî dikarin bi kom û kombûnên zanistî bêne çareser kirin. Hasilî gava esasî û lezîna çêkirina projeya yêkkirina alfabeyê, anjî yêkkirina sembolên alfabeyê ye û ev alfabe ji aliyê sembolan ve yêkbûyî jî divêt bi tîpên [sembolên] Latîni be. Boçî Latîni be? Ew jî dikare bi argumentên zanistî bête rave kirin ku eve jî dikare di nav prosesa xebatên vê konferansê anjî di xebatên zanistî yên zimanî yên paşerojê da bête kirin. [Li vê derê em dikarin pirsê alfabe û sembolan ji hev cuda bikin. Ji ber ku di alfabeza zaravayê Soranî da deng û li goreyî van dengên jî sembol ji hejmara alfabeza Kurmancî zêdetir in. Lewma her zarava bi alfabeza dengên xwe yên cuda, lê bi sembolên wekî hev bêne nivîsin, hingê di gava ewilî da di hev gihîştinê da mumkun bibe. Anku pêkve zaravayên Kurdî bi deng û alfabezên xwe, lê bi sembolên Latîni ve bêne nivîsin, di qonaxa destpêkê da dê gaveke gelek giring û di cih da be. Yêkkirina sembolan dê di hevdu gihîştinê gelek sanahî û rehet bike.]

Di encam da jî, ji bo hemû pirozîk û arêşeyên zimanî û helbet di serî da alfabe û mijarên dî divêt “Şûrayeke bilind ya zimanê Kurdî” bête tesbît kirin û ev “şûra” divêt ji zana û bisporên zimanî pêkbêt û bi metodên zanistî xebatê bike. Esasen “Şewira Ziman û Perwerdeya Kurdî” bi biryara “Şûraya Ziman û Perwerdeya Kurdî” ya ku li Teşrîna [November] 2009ê da li Brukselê ji aliyê Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKê ve pêkhatî hate tenzîm kirin. Ew organ dikare bête nûvekirin û xurt kirin. Çawa tenzîmkirina pirs û pirsgirêkên dîni didine ber destê “Şûraya bilind ya dîni”, divêt li ser meseleya ziman jî bi eynî giringîyê bête rawestan û “Şûraya Bilind ya Zimanî” bête durust kirin.

Ziman wekî organekî jînde divêt bi baldarîyeke bilind bête sexbêrî kirin ku bigihe, pêşve biçê, xurt bibe. Eve berpirsîyarîya her Kurdekê, lê helbet di serî da erkê bispor û zanayên zimanî û dem û dezgehên akademîk yên zimanî ye.

Hêvî dikin di prosesa yêkkirina alfabeza Kurdî da, [anjî yêkkirina sembolên alfabeza Kurdî da], ku eve jî divêt bi tîpên [sembolên] Latîni be, gaveke saxlem bête avêtin û dest bi kar bin û ev konferanse jî bibe merheleyeke giring ji bo vê armancê.

Û spas.

**ROJAN HAZIM**

Serokê Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKê

19 – 20 – 21 – 22 Îlon 2011, Hewlêr